

DESTANA GÊRÎKÊN AZAD

“Em ê dibistanên ku gêrîkan dikin fil vekin... Ew ê bibin fil û xwe fil bihesibînin, lê ew ê qet ji bîr nekin ku ew filên bi qasî gerîkan in.”

Bi van rêzikan, ez dibêjim qey mirov dikare romana Yaşar KEMAL bide naskirin. Romana kedxwariyê, bişaftinê, talankirinê; serxwebûnê, azadiyê û ronahiyê...

Jixwe, her kes, ne romannivîsiya wî be jî, navê Yaşar Kemal dinase. Ji ber ku li ser wî di nav kurdan de gelek nîqaş hatine kirin. Li ser kurdbûna wî, bikaranîna wî ya çîrok û destanên kurdî û hwd.

1.

Di edebiyata tirkî de gelek kesan, di romaneke xwe de be jî, behsa kurdan kirine û jiyana û tecrubeyên wan ji xwe re kirine malzeme. Yaşar Kemal, Orhan Kemal, Kemal Tahîr, Fakîr Baykûrt, Azîz Nesîn, Esmâ Ocak, Fîruzan, Yılmaz Guney, Ferîd Edgu, Ahmet Altan, Orhan Pamûk û hwd. Tew em behsa helbest û çîrok û şanoyê jî nakin li vir.

Di edebiyata tirkî de yê ku herî zêde ji çanda kurdî destkewtî bûye, Yaşar Kemal e. Hema mirov dikare bibêje, di hemû berhemên wî de kurd hene. Jiyana kurdan ya gundan, karkerî û paletiya wan ya li Çukurowayê, mêrxasiya wan, şerê wan yê li dijî kedxwaran; evînen wan, bîr û baweriyên wan, bêrikirinên wan, tenêtiya wan, sirgunbûna wan...

Yaşar Kemal, di gelek romanên xwe de jî, ji destan û çîrok û efsaneyên kurdan derketiye rê û afirandiyê. Gelek mesele û çîrokên ku di nav kurdan de hatine gotin, di romanên wî de bûne bûyer û derketine holê. Yaşar Kemal di hin hevpeyvînan xwe de behsa têkiliya xwe û kurdîtiyê dike. Ew jî bi xwe dibêje “ez di nav wan de mezin bûme û min gelek tişt ji wan stendine.” Bes yê ku nizanibe, ew ê bibêje qey, ev tiştên ku di romanên wî de hene, Yaşar Kemal ji ber xwe ve afirandiyê. Ev jî xusûsiyeteke wî ya din e. Qey, wî belasebeb naşibînin Homeros!

Ji xwe navê gelek lehengên wî bi kurdî ne. Gelek lehengên wî jî bi hemû xusûsiyetên xwe ji nav efsaneyên kurdan derketine. Mirov dikare di vir de behsa Husoyê Hesinker (Efsaneya Çiyayê Agirî) û Hesinkerê Kulek yê rîhsor (Siltanê Fîlan) bike. Herdu jî Kawayê Hesinker temsîl dikin. Herçî Rohat e, gava ku behsa Husoyê Hesinker û hin kesên mîna wî dike (Yaşar Kemal’in Yapıtlarında Kürt Gerçeği), dibêje “dişibiyê”, bes nabêje “bi xwe ew e.”

Di edebiyatê de, bikaranîna hêjahiyên weha, yê kîjan gelî bin jî, normal e. Xwezî nivîskarên me yê kurdî jî bikaribin çîrok û efsane û destanên me bi kar bînin û berhemên weha, mîna yê Yaşar Kemal hêja biafirînin.

Yaşar Kemal, di edebiyata tirkî de cîhekî xusûsî digire. Ew bi xwe kurd e û bi çîrok û destan û stranên kurdî mezin bûye. Çanda kurdan baş dinase. Weke nimûne, heke mirov bibêje, tesîra dengbêjiya di nav kurdan de û binavûdengbûna dengbêjan hingî tesîreke mezin li Yaşar Kemal û berhemên wî jî dike. Gêrîkê Dengbêj (Siltanê Fîlan), Abdal Sofî, Aşık Hasan (Kimsecik)...

Fethî Nacî jî, eynî mîna Rohat, di berhemên xwe de bi dorfirehî li ser Yaşar Kemal disekine û di nivîseke xwe de gava behsa têkiliya Yaşar Kemal û folklorê dike, ew jî behsa wê şûna İsmail Axa ya di romana Deriyê Kelehê (Kale Kapısı) de ye dike (Eleştirî Günlüğü). Bes ew behsa kurdbûna van formên folklorîk nake. Hin nixên ku Yaşar Kemal ji kurdan fêr bûye, dişibine koroyên tragedyayên Yewnanî. Di vir de rengê karê ku Yaşar Kemal dike, tê guhertin. Wî hay jê nebe jî. Fethî Nacî, di eynî pirtûka xwe de dibêje:

“Bes Yaşar Kemal heye di romana me de, ku gundiyan eynî mîna wan rê dide; Yaşar Kemal bi jiyana û tecrubeyên xwe ve girêdayî maye, ji realîtiyê bi dûr neketiye. Ji lewre, ji bo ku mirov gundiyan tirk baş binase, di destê me de çavkaniya sereke, romanên Yaşar Kemal e.” (Nivîsa bi navê Yaşar Kemal ve Türk İnsanı)

Li ser Behr Xeyidî (Deniz Küstü) jî weha dibêje Fethî Nacî:

“Li Menekşeyê paşgotinî dest pê dikin. Yaşar Kemal van paşgotiniyan mîna koroyên di tragedyayên Yewnanî de bi kar tîne: Çima giriya di nexweşiyê de heta sibehê/ Navê kê wirêne dikir?/ Ew, ne ew bû, ew, ne ew bû.../ (...) Ew kî bû?/ Li benda yekê ma Selîmê Masîgir./ Çil salî li benda yekê ma./ Her tiştî ji bo wê kir. / Nehat./ (...) Gava ku ew nehat jî...”(Roman ve Yaşam)

Ji xeynî kurdan, li ser dîrok û çandên gelên din yê ku li Anadolîyê û Mezopotamyayê jiyane û dijîn jî zanebûneke Yaşar Kemal heye, ku hişê mirov nagihêje. Di romana xwe ya bi navê “Ava Ferat Xwîn

Dihêrike Lê Binihêre” û yên berî wê de, mirov dikare vêya bibîne. Lê belê ji ber kûev mijar bi xwe dikare bibe mijara nivîseke din, em zêde li ser hûr nebin, dê çêtir bibe. Ez bawer im, mînak û nirxandinên ku min li jorê kirine, ji bo xwendevanên me yên ku ji berê de bi romanên Yaşar Kemal dizanin û hay ji vê rewşê heye, dê bes bin. (Ji bo hin nimûneyên din, bnr. Li Yaşar Kemal’in Yapıtlarında Kurt Gerçeği, Weşanên Fırat, Stembol.)

2.

Mîna ku di gelek romanên xwe de kiriye, di Siltanê Fîlan de jî, Yaşar Kemal ji destaneke kurdan derketiye ser riyê. Di vê romanê de kurd bi her aliyên xwe dixuyên. Lê, cudayetiyeke vê romanê heye. Ev roman bi xwe, mirov dikare bibêje, romana kurdan e.

Di romanê de kurd dibin gêrik û welatê wan ji aliyê filan ve tete dagirkirin. Lê berî wê, Siltanê Fîlan qasidekî dişîne welatê gêrikan. Qasidê wî, serokê hudhudan, Serkumikê Berz an jî Silêmanê Dunikil, li welatê gerikan bi xwarin û vexwarin û xatir û mêvanperweriyeke bêqusûr tê ezibandin. (Yaşar Kemal, bi vî awayî, mêvanperweriya kurdan nîşan dide.) Heft mehan li wir dimîne. Dû re tê û ji Siltanê re behsa gêrikan û welatê wan dike.

“Serkumikê berz dest pê kir. Her ku wî digot, Siltanê Fîlan ji kêfa ji ser hişê xwe diçû. Ji ser hişê xwe diçû û bê rawestan, pirs li dû pirsê ji serkumikê berz dikir.” (Rûp. 18)

Bereketa axa welatê kurdan û jîriya wan, bi sembolên jiyana gêrikiyê xwe dide der.

“Bajarin ava kirine, qet nepirse siltanê min, di bin erdê de. Bajarin medenî, bi heybet. Embarên wan sal duwanzdeh meh heta ber dev bi xwarin, hunguv, navika kulîlkan, zad û kêzikên mirî ve dagirtîne. Paytextên xwe tam di orta deştên fireh de ava kirine. Ev deşt ji peravên Nîlê jî ji Çûkûrovayê jî hîn bi berekettir in... Aliyê bakur ê vî welatî hemû daristan e. Daristaneke weha ye ku piling têkevê nema dikare ji nav derkeve. Aliyê başûr jî sal duwanzdeh meh tev şînkayî ye. Deşteke fireh û heta çav çavan dibîne rast û sal duwanzdeh meh heta ber dev bi kulîlkan ve dagirtî. Rojhilatê wê zevî, rojavayê wê zevî, tu can lê biçînî, tu çûkan lê biçînî, tu gêrikan lê biçînî dê şîn bibin.” (Rûp.19)

Him Siltanê Fîlan him jî qasidê wî ji kêfan difûrin. Dû re siltan hemû filên xwe dicivîne û bi wan jî dide guhdarkirin. Piştî ku êdî biryara xwe dide, ji bo ku ji xwe re alîgiran bibîne, dest bi siyasetê dike û şexsiyeta dagirkeran nîşan dide. Ji bo ku hudhudan bikişîne cem xwe, ji serkumikê berz re dibêje:

“Gidî, tu çi sekiniyî, birayê min î Serkumik, zû bangî wan jî bike... Beyî artêşa hudhudan, beyî wan hudhudên xwediyên baskên sivik û kumikên turuncî, ez li vê dinyayê dikarim çi bikim... Zû bangî wan bike, ez wan hemûyan dixwazim.” (Rûp.20)

Siltanê Fîlan artêşa xwe dide dora xwe û berê xwe dide welatê gêrikan. Ji bo ku artêşa xwe motivevî şer bike, Siltan peyvî weha dike ku em giş ji berê de bi wan dizanin. Karê xwe bi pisporî dimeşîne. Dîroka dagirkerên welatê kurdan jî bi peyvên bi vî rengî mişt tije ye.

“...Serleşkerên min, ez ji we re dibêjim; hûn ê filê ku dilê wî piçekî jî bi gêrikan bişewite, bikujin. Dilên leşkerên filan bi kesî naşewitin. Leşkerên filan ji bo parastina dewleta filan a herî dawiyê, êşê nêzikî dilê xwe jî nakin. Filno, birayên min, ev şerê we yê mezin î yekem e. Ger em di vî şerî de bi ser kevin, em ê bibin zalên dinyayê.”(Rûp.22)

Dû re jî Yaşar Kemal êdî Siltanê Fîlan deşîfre dike û bi me dide naskirin. Siltanê Fîlan weha dibêje:

“Ger em di vî şerê îroj de, li hember gêrikên ku dijminatîya me dikin û êrîşî welatê me dikin, tam bi ser nekevin, dîrok û dîroka filan dê me qet efû neke... Nesilê filan dê ji ser ruyê dinyayê rabe. Ji ber vê yekê, filno, birayên min, leşkerên min, divê em di vî şerê îroj de bi ser kevin û li welatê gêrikan kevir li ser kevirî û tu benderûhan nehêlin.”(Rûp.23)

Serê sibehê, fil, xezeba xwe bi ser gêrikan de dirijînin. Her derê li bin guhê hev dixin. Toz û dûman radiibe. Mijeke reş xwe bera ser welatê gêrikan dide. Xwîn diherike, serî difirin. Gêrik, tevî avahiyên xwe di bin lingên filan de dipelçiqin. Welatê wan tev hildiweşe.

“Hawar û gazî bi derbekê re di ezmên re derketin.”(Rûp.23)

“Gava roj çû ava, hejmara gêrikên li welatan daketibû nêvî.”(Rûp.24)

Gêrik hê jî dijminê xwe nas nakin. Xwe diavêjin bextê Silêmanê Dunikil, dostê xwe yê kevin. Sulêmanê Dunikil dibe qasidê wan jî û wan dibe bi Siltanê Fîlan re dipeyvîne. Gava ku siltan dibêje,

“Heyf bû, me baş nekîr ku me bajarên hemû welatan hilweşandin,” serkumikê berz dibêje:

“Na, ne heyf bû. Ji ber ku gêrikan baş fahm kirin bê fil kî ne, careke din heta qiyametê, nema dikarin li hember filan serî rakin. Ji bo gêrikên pelçiqîn jî serê xwe neêşîne. Li vê dinyayê ewqas pir welatê gêrikan, ewqas pir gêrik hene ku em nikarin wan bi mêjiyên elektronîk jî bihejmêrin, em nikarin wan ne bi pelçiqandinê û ne jî bi kuştinê biqedînin.”(Rûp.25)

Serkumikê berz, gêrîkan baş nas dike. Gava ku Siltanê Fîlan dibihîse di nav gêrîkan de hesinker jî hene û ecêb dimîne, jê re dibêje:

“... Li dinyayê çi qas meslek hebin, hemû li ba gêrîkan jî hene. Di nav mexlûqan de mîmar û muhendîsên herî baş ji nav gêrîkan derdikevin. Tê gotin ku di nav mexluqan de, hesinkerên yekem jî gêrîk bûn.”(Rûp.27)

Gêrîkê Rîhsor yê Hesinker, di nav gêrîkan de yê herî zane û gihîştî ye. Di şer de lingekî wî jê dibe û dibe Hesinkerê Kulek yê Rîhsor. Ji ber ku Siltanê Fîlan bi zimanê gêrîkan nizane, Silêmanê Dunikil di nav wî û Gêrîkê Rîhsor yê Hesinker de wergêriyê dike. Gava ku Rîhsoro gazinên xwe yên li ser vê êrîşa filan ya bêsebeb dike, Siltanê Fîlan dîsa peyvên ku em giş baş dizanin, dike. Ev beşa romanê, ya ku Siltanê Fîlan û Gêrîkê Rîhsor yê Hesinker munaqaşeyê dikin, di romanê de cîhê herî balkêş e, ji bo mirov serboriya gelek welatên bindest fahm bike.

“Ma min, ma filan êrîştî we kir? Ma tu dîn î, Hesinkero? Neteweyê filan tu carî êrîştî tu neteweyan nake. Neteweyê filan aşitîxwaz e, xebatkar e, egîd e. Ji bo çi ew ê bêsebeb êrîştî welatê gêrîkan bike? Tu divê vêya baş bizanibî Serokê Hesinkeran ku em, fil bi tenê xwe diparêzin... Hemû dinya bi vêya dizane. Êrîşa yekem ji gêrîkan hat, we, gêrîkan malên me û bajarên me bi ser serê me de hilweşandin. A, we bersîva xwe jî stend. Belê belê, we stend. We filên aşitîxwaz anîn xezebê...”(Rûp.29)

Gêrîkê Rîhsor neçar dimîne û ji tîrsa kuştina xwe, hew dikare tiştêkî bibêje û ew tiştên ku siltan gotin dipejirîne. Demeke dirêj napeyivîn. Şer hê jî nesekiniye. Demekê li ser rewşa welêt daxil dibin. Wê gavê Gêrîkê Rîhsor ji bo ku şer bide sekinandin, dibêje:

“Siltanê me, me di te de kir, tu di me de neke. Lê binihêre, ger şer weha dewam bike, li welatê me dê gêrîkek bi tenê jî nemîne. Pirraniya wan dê bimirin, birîndar bibin, hin ji wan jî dê xwe li çiya û daristanan bigirin û li hemberî we dest bi şer bikin.”(Rûp.31)

Li ser vê peyva wî, Siltanê Fîlan dikene û henekê xwe bi wî dike. Rîhsoro jî her tiştî dide ber çavên xwe û dibêje:

“Em ê heya van welatan û vê şikenandinê hilînin, hey siltanê zalim, hey siltanê bêmejî, hey siltanê gêj. Em ê vêya ji te re nehêlin. Hey yê ku ji serî heta binî de di nav xwîne de dakirî, tu heeey çiyayê zilmê yê kor û zirecêb. Ev tiştê ku te kiriye, dê ne ji te re û ne jî ji wî Serkumikê Berz yê kal re bimîne. Di demeke pir nêzik de tu ê ji wan gêrîkên biçûçik yên ku bi qasî serê derziyê biçûçik bela xwe bibîne û li hember hemû mexlûqên dinyayê rezil bibe, tu ê rezil û ruswa bibe.”(Rûp.32)

Hesinkerê Rîhsor xwe ji ser baskên Silêmanê Dunikil diavêje û direve. Tu kes hew dikare şopa wî bibîne. Wenda dibe. Giş dibêjin qey mirî ye. Piştî ku ew ji ortê wenda dibe, gêrîkên ku dimînin, hemû şertên siltan qabûl dikin û neteweyê gêrîkan dibe êsîrê neteweyê filan. Êdî siltan wan ji bo xizmeta xwe dixebitîne. Sembolên kedxwariya ku li welatê kurdan jî tê meşandin, di vê beşê de derdikeve holê. Gêrîk dibin koleyê siltan. Ji wî re serayan çêdikin, embarên wan serayan heta dev bi xwarinê dadigirin. Nikarin dengê xwe jî li hember daxwazên siltan ku dawî li wan nayê, derixin. Yaşar Kemal, mahneya vê peymanê ji devê Gêrîkê Dilqecêb yê ku şagirtê Rîhsoro ye dide:

“Em mirin, neteweyê gêrîkan êdî qediya. Neteweyê me yê ku di tu demên dîrokê de nehatibû hêsîrkirin, bû hêsîrê filan. Em bûn kole, kole. Aqilê min û dilê min ji min re dibêjin ku xwezî me şertên Siltanê Fîlan qebûl nekiribana. Bila me ew qebûl nekiribana û bila filan em hemû bikuştana. Êdî heta qiyametê em ê mîna kole û hêsîran bijîn.”(Rûp.50)

Pêvajoyeke nû dest pê dike. Siltanê Fîlan ji bo ku berdewamiya desthilatdariya xwe ya li welatê gêrîkan ava bike, bi şewirdarê xwe serkumikê berz re difikire. Sîstema ku li mirovîstanê jî tê meşandin ji xwe re mînak digire. Ewî, ji bo ku koka muxalîfiyê biqelîhîne, peyva “KEDXWARÎ” ji ferhengan dide derxistin. Dû re ew teoriya ku kurd jî pir baş bi wê dizanin, vedibêje. “Teoriya Eslê Gêrîkan.”

Di ber re jî, Siltanê Fîlan ji Rîhsoro ditirse. Ji bo ku Rîhsoro bigirin û tavilê bi şikenceyan bikujin, planan çê dike. Ev planên wî jî ne biyanî ne. Weha emir dide Silêmanê Dunikil:

“Divê lîstikeke weha bileyizin da ku gêrîk Rîhsoro bi destê xwe bigirin û ji me re binin, an sax an mirî... Bila hemû dinya pê bizanibe ku heta Rîhsoro an sax an mirî neyê peydakirin, rehetî ji min re tune ye û welatên gêrîkan rehet nehêlim.”(Rûp.54)

Dû re jî dibêje:

“... ger em bikaribin gêrîkbûna wan bi wan bidin jibîrkirin, wê gavê em ê her tiştî qezenc bikin. Ev sîstem dê heta qiyametê bidome û hûn ê jî û em ê jî li ser piştê gêrîkan, bi saya xwêdana eniya wan, di bihuştê de bijîn.”(Rûp.55)

Êdî pêvajoya bişaftina gêrîkan dest pê dike. Dibistan vedibin. Zarokên gêrîkan giş fêrî zimanê filan û filîtîyê dibin. Giş mîna filan radibin û rûdinên. Teoriya siltên ya li ser esilê gêrîkan kêfa wan tîne û pê dipesinin û dibêjin:

“Dibe ku me fil anîbin dinyayê...”

“Em bapîrê filan in, bapîrê filan...”

“Gêrîkek tê mahneya filekî...”

“Her gêrîkek filek e...”(Rûp.61)

Siltanê Fîlan bi ser dikeve. Gêrîk giş mîna filan dijîn û ji bo ku siltan dîsa wan bike filên mezin, bi heyecan dixebitin. Ji filan bêtir dibin filperest. Mîna wan qûna xwe di daran de didin û dixurînin û kêfê dikin. Her tiştê li ser gêrîktîyê ji bîr dikin.

Xusûsiyeteke din î vê romanê heye ku di romanê de gelekî balê dikişîne. Siltanê Fîlan, ji bo ku gêrîkan heta qiyametê bike hêsîrê xwe li rêyan digere. Ji bo dîtina çareyekê bangî hudhudan û gêrîkên zerî jî dike. Difikire, dû re jî riya ku gêrîkan heta roja qiyametê bike hêsîr peyda dike.

“Pirsa herî sereke ziman e. Vêya ji bîr nekin. Ew ê berê zimanê xwe ji bîr bikin û gêrîkbûna xwe wenda bikin û ew ê ji dil bixwazin bibin fil... Ji berdêla ku mirov serê gêrîkan jê bike, ya rasttir ew e ku mirov zimanê wan jê bike.”(Rûp.73)

Ev peyv ji bo girîngiya zimên gelekî balkêş e. Siltanê Fîlan, zalimekî mezin e, zana ye. Di riya hebûna neteweyekî de bi rola zimên jî dizane û wê dihesibîne. Ji ber ku gava neteweyek zimanê xwe ji bîr bike, mirov dikare her tiştê wî jê bistîne. Her neteweyek bi zimanekî ye. Xusûsiyeta ku neteweyan ji hev cuda dike jî ev e. Her tiştê neteweyekî dikare were guhertin, bişibe neteweyên din, bes heta ku zimanê wî hebe, tu kes nikare netewebûna wî bi wî bide jibîrkirin. Siltanê Fîlan jî dizane ku heta zimanê wan hebe nikare bi gêrîkan. Ji lewre, berê berê ji zimên dest pê dike. Tev li yê gêrîkan, zimanê hudhudan jî qedexa dike.

Ji bo ku di vê riyê de bi ser bikevin, tavilê dest bi xebatê dikin. Li aliyê din jî Gêrîkê Rîhsor yê Hesinker xebatên xwe didomîne. Rîhsoro derketiye serê çiyê û yên ku ji ber zilma filan reviyane li dora xwe civandine. Her û her dixwîne. Qet ecele nake. Gava gêrîkên ku xwe li dora wî girtine bêsebiriyê dikin û dixwazin zû bi zû bi filan re şer bikin jî ew her ji wan re behsa ava ku dibû kelmîzo dike.

Siltan ji bo ku wî bide girtin çî ji destê wî tê, teqşîr nake. Gêrîkên Zerî li wî sor dike û dişîne pey kuştina wî. Serokê Gêrîkên Zerî û zîlamên xwe, rîhên xwe boyax dikin û dikevin nav rîhsoran. Lê tu carî bi ser nakevin.

Şevêkê gava ku gêrîk dîsa qûna xwe di daran didan û ji ser hişê xwe ve diçûn, dengêkî ku ew ji berê de nas dikin pêl bi pêl belav bû li welatê wan. Stranek dihat gotin. Strana Gêrîkê Dengbêj. Ev stran, guhertineke weha di dil û mejiyê gêrîkan de çê dike ku tiştê bi wan herî xweş dihat, da terikandin. Kir ku hew qûna xwe di daran de bidin û bixurînin.

“Vê stranê tiştekanî bîra wan. Di dil û hinavên wan de tiştin dilivandin. Ê stran qut nebû. Ecêbiyek, xelûbelek, xulxulek û tevgerekê dest pê kiribû... Stranê her dom kir. Gêrîk, weke ku ji xeweke giran, tarî û xewneke kabûsî şiyar dibûn...”(Rûp.213)

Strana ku tê behskirin jî li gorî formên stran û kilamên dengbêjiyê hatiye hîlbijartin. Ev jî tîkîliya Yaşar Kemal û hezkirina wî ya li ser dengbêjiyê, bêhtir nîşan dide.

“Stranê digot ku em gêrîk in. Wextekê em jî gêrîkên weke gêrîkan bûn û welat û bajarên me yên weke bihuştê hebûn. Em bi xwe dixebitîn û me bi xwe dixwar. Em weke hev û azad bûn...”(Rûp.213)

Li her derê ku gêrîk lê hene, ev stran belav dibe. Heta digihêje cem Gêrîkê Rîhsor jî. Ecêb dimîne û dipirse. Kes pê nizane. Dû re, çavkaniya stranê ji devê hevaleyê Rîhsoro eşkere dibe:

“... Ev stran ji dilê me û fikra me tê.”(Rûp.231)

Av bûbû kelmîzo. Stranekê her tişt guhertibû û kiribû weke berê. Dengbêjên kurdan çiqas xurtbin, Gêrîkê Dengbêj jî ewqas xurt e. Gêrîkbûna gêrîkan ji nû ve tîne bîra wan. Fînalê romanê jî bi vî awayî ji her halê xwe yê dikarîbû bibûya, xurttir bûye. Di romanê de beşa herî xweş jî ew bû ji xwe.

Di dawiyê de hesinkerê rîhsor yê kulek, gava ku li serê çiyê agirê azadiyê vêdikeve, tevî serê gêrîkên zerî li piştê kevoka spîboz siwar dibe û xwe li qesra Siltanê Fîlan datîne.

“Ez Hesinkerê Kulek im. Me jî îro û pê ve, serxwebûna xwe îlan kir...” (Rûp.237)

“Erd bi carekê ve qeliştî, seray jî, bexçe jî û Siltanê Fîlan jî dabelihandin. Gava gêrîkan binê welatan kolabûn, binê seraya siltên jî ji bîr nekiribûn.”(Rûp.239)

3.

Ev romana Yaşar Kemal, di sala 1977'an de hatiye weşandin. Îsal jî wergera wê ya ji aliyê Mustafa Aydoğan hatiye çêkirin, ji nav weşanên Nûdemê derketiye. Bîst û yek sal... Kî bîra ku ewqas sal in pirtûkxaneyê kurdî nebûye xwedî pirtûkeke weha.

Yaşar Kemal di vê romanê de jî behsa kurdên bindest dike. Behsa dagirkeran, kedxwaran û kurdan dike. Fîlan û Gêrîkan ji xwe re dike sembol. Daxwazên kurdan û hemû gelên din yê bindest, ji devê gêrîkan dide. Bi vî awayî careke din jî diyar dibe ku tu carî edebiyat li hember pirsên civakî, laqayt namîne. Yaşar Kemal berpirsiyariya xwe ya rewşenbîrî û nivîskariyê bi cîh tîne.

Yaşar Kemal'ê ku destanên kurdan baş nas dike, gelek motîfên Destana Kawayê Hesinker bi kar aniyê di vê romanê de. Li ser çapên wê yê kevin, ji bo vê romanê hatibû gotin ku "romana zarokan" e. Ji ber ku naşibe romanên dema xwe û di gelek deverên wê de motîfên çîrok û destanan heye û Yaşar Kemal jî mîna çîrokbêjekî vegotiye, mirov dikare vêya bipejirîne. Dibe ku ji ber rewşa wê demê ya siyasî be jî. Bes di çapên wê yê din de ev nîşe ji pirtûkê hatiye derxistin.

Gelek kesên ku li ser berhemên Yaşar Kemal serê xwe eşandine û lê kolane. Ji van rexne û lêkolînên xwe berhemên nû afirandine. Bes gava ku mirov li wan berhemên dinîhere, dibîne ku behsa her romana Yaşar Kemal dibe, behsa Siltanê Fîlan nabe. Rohat Alakom jî (Yaşar Kemal'in yapıtlarında Kürt Gerçeği. Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler.) ev roman nedîtiye û Fethî Nacî yê ku mezintirîn rexnegirê edebiyata tirkî ye û li ser Yaşar Kemal gelek caran nivîsandiye jî. Kurd jî bi kurdiya wê bi romanê dihesin. Heta nuha wan jî hay jê nebûye.

Gava min ev roman dixwend û min dît bê fil çawa û çima welatê gêrîkan dagir dikin, ez gelekî li ber ketim. Min di her rûpela vê destana berxwedana gêrîkan de, kurd dît. Min xwe dît. Ez jî bi wê strana ku Gêrîkê Dengbêj digot ji ser hişê xwe çûbûm. Min heta nuha romaneke weha xweş nexwendiyê.

Yaşar Kemal ji bo ku vê romanê binivîsîne, divê him di jiyana û tecrubeyên kurdan, him jî di jiyana gêrîk û fîlan de gihîştî be. Zimanê Yaşar Kemal jixwe bîhna kurdî dide der. Mirov wê tahma kurdî di hemû berhemên wî de dikare bibîne. Yaşar Kemal, Gêrîk û fîlan jî ewqasî baş dinase ku mirov lê ecêb dimîne. Mirov dibêje qey Yaşar Kemal di nav wan de mezin bûye. Mirov gelek tiştan ji vê romanê fêr dibe.

Tu carî min pirtûkeke kurdî di carekê de nexwendibû, digel ku 240 rûpel bû jî. Jixwe mijara romanê, bi xwe xweş e. Tew ku bi kurdî be jî, mirov tahmeke din jê distîne. Min du caran xwend, ez jê têr nebûm. Divê ev pirtûk di pirtûkxaneyê her kurdî de hebe. Divê her kurd hewl bide xwe ku ji tecrubeyên gêrîkên Yaşar Kemal îstîfade bike û wana di xebata jiholêrakirina hemû neheqîyan û zilman de bi kar bîne û riya pêşerojê rohnî veke...

Divê mirov di vê derê de li ser tiştêkî din jî bisekine. Di pêşketina zimanê me de rola wergeran nayê înkarkirin. Gelek formên ku heta niha di kurdî de nehatine bikaranîn û ji bo pêşketina ziman û edebiyata me jî gelekî pêwîst in, bi têkîliya wergeran dikevin zimanê me. Ji ber ku di wergeran de ziman bi hev û dû re têne muqayesekirin. Wê gavê çî formên peyvê û nivîsê ku heta niha me nedîtine dikarin têkevin zimanê me jî. Bi vî awayî zimanê nivîsa me jî dê bibe xwedî herikîneke hêsantir û xurt bibe. Yanê, zimanekî mîna kurdî, bi wergeran dikare gelekî zûtir bi pêş bikeve. Bes bi wergerên mîna vêya baş û biserketî...

Heta niha çend wergerên din jî min xwendibûn, bes ez li vê wergerê heyirîm û devê min ji hev çû. Gava ku ziman hatiye wergerandin, pirtûk qet xera nebûye. Ji çend cîhên bêqiyet pê ve mirov bawer nake ku ev roman bi kurdî nehatiye nivîsandin. Bi xêra xebatên weha, mirov bêtir hez ji zimanê xwe dike û di vê riya pêşveçûna ziman û edebiyata kurdî de bêtir bi hevî dibe.

Min berî niha bi du salan wergera Mustafa Aydoğan ya çîrokan Jack London (Zaroka Şevê, Weşanên Nûdem, 1996) jî bi dest xistibû. Di herdu wergerên wî de jî kemasiyên ku divê mirov li ser bisekine, tune bûn. Ez bawer dikim ku bi wergerên bi vî rengî, berdewamiya jiyana kurdî dê misoger bibe. Hêvîdar im ku edebiyat û zimanê me her bi xebatên weha baş bixemile û şewqê bide dora xwe.

Weke ku Siltanê Fîlan jî dibêje:

"Pirsa herî mezin ziman e."